



Qanûna Parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê

> Dêbav û sergêrên qanûnî yên zarokan

Masernschutzgesetz – Merkblatt für Eltern und Erziehungsberechtigte – kurdisch

Pirsên nasyar derbarê Qanûna Parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê

1. Çima Qanûna Parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê heye?

Sorik ji nexweşiyên bi-kêmgirtin ên herî vegir di nava mirovan da ye. Nemaze di zarokên bin temenê 5 salî û mezinan da renga Nexweşiya Sorikê bibe sebaba qewimîna pirsgirêkên giran. Ji wan hawkirina (iltihab) guhê navîn, hawkirinên pişikê û vijik (ishal) û di babetên kêmdîtî da heta hawkirina mejî û gengaz e bibe sebaba qewimîna dûhatên din ku derengtir diyar dibin. Bi giştî li welatên pêşketî derdora 1 heta 3 kesan ji her 1000 kesên tûşbûyî bi Nexweşiya Sorikê canê xwe ji dest didin. Li Almanyayê jî di heyama salên bihurî da, hin babetên mirina ji ber tûşbûna bi Nexweşiya Sorikê hebûne.

Kiryarên niha jibo zêdekirina asta derzîlêdan û fetrûmekirinê hîn nebûye sebeb ku gellek kes li Almanyayê têra xwe, xwe dijî vê nexweşiyê fetrûmekirî û parêzbandî bikin. Hîn jî hin valahî di warê fetrûmekirin û derzîlêdanê da hene, bi awayekî ku her salê hema wisa bi sedan û heta bi hezaran kes li Almanyayê tûşî Nexweşiya Sorikê dibin. Kontrolkirina vê nexweşiyê di rewşekê da pêkan e ku sedî 95ê xelkê li hemberî nexweşiya Sorikê hatibin parêzbandîkirin. Li gorî vê qanûnê, divê parêzbandî ji riya fetrûmekirinê li wan navçeyan zêde bibe ku belavbûna Nexweşiya Sorikê renga gellek bilez biqewime, di halekî da ku mirov têra xwe li hemberî Sorikê ewleh nînin û li wan navçeyan bi taybet ew kes bîn parêzbandîkirin ku nikarin xwe li hemberî Sorikê fetrûmekirî bikin, wek mînak ji ber vê yekê ku hîn temenê wan jibo fetrûmekirin û derzîlêdanê gellek biçûk e (zarokên bin 9

mehî) û jinên ducanî ne an pergala ewlehiya leşî ya wan gellek lawaz e. Ev kes hewcedara wê yekê ne ku kesên din bi hev girtin û hevdilî tevbigerin û xwe fetrûmekirî bikin anku derziya vê nexweşiyê lêdin.

2. Qanûna Parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê ji kengê va bawerpêkirî ye?

Qanûna Parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê di 1ê Adara 2020î da cih hat.

Tevahiya zarokên ku di roja 1ê Adara 2020î da li navenda têkildar di bin çavdêrî û baldariyê da bûn, divê heta roja 31ê Hezîrana sala 2021ê belgeyekê raber bikin.

3. Qanûna Parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê kijan zarokan digire ber xwe?

Ev qanûn tevahiya wan zarokan digire ber xwe ku temenê wan herîkêm yeksalî ye û

1. li navendeke komkî da di bin baldarî û lêmiqatebûnê da ne: Navendên Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan û Navendên Miqatebûna ji zarokên di temenê dibistanê da, cûreyên taybet ên baldariya ji zarokan, dibistan û navendên din ên perwerdehiyê ku di wan da pirranî kesên bin temenê qanûnî tîn baldarîkirin.

2. bi qasî çar hefteyan

a) li perwerdegehekê tîn baldarîkirin an

b) li sitargeheke komkî ya taybetî penaxwaz û penaberan an koçberên zûhatî tîn bicihkirin.

Tevahiya zarokên ku temenê wan herîkêm yeksalî ye, divê derziyeke parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê wergirtibin an li hemberî Sorikê parêzbendiya wan hebe. Tevahiya zarokên ku herîkêm temenê wan dusalî ye, divê herîkêm du derziyên parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê wergirtibin an têra xwe parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê biselimînin.

Zarokên ku ji ber qedexetiya bijîşkî (qedexetiya bikaranînê) nikarin bîn fetrûmekirin û belgeya têkildar raber bikin, nakevin bin van rêzik û qiraran anku ji vê yekê tîn vawêrtin.

4. Ez çawa divê biselimînim ku zarokê min li hemberî Sorikê hatiye derzîlêdan û fetrûmekirin?

Raberkirina Karta Derzîlêdanê anjî belgeyeka piştrastkirina bijîşkiyê derbarê fetrûmekirina tomarkirî ya têkildar li hemberî Nexweşiya Sorikê – bi giştî wek Fetrûmekirina li hemberî Sorik - Bineguh (Mumps) – Röteln (MMR) her wiha di pêveka lênûska lênêrîna zarokan, wek belge tê naskirin.

5. Min Karta Derzîlêdanê ya zarokê xwe wenda kiriye. Gelo ew aniha divê careka din li hemberî Sorikê were fetrûmekirin?

Heke Karta Fetrûmekirinê hatibe wendakirin, sê halet gengaz in:

1. Heke fetrûmekirina li hemberî Sorikê ji ser belgeyên bijîşkiyê were têderxistin, renga karteke nû ya Fetrûmekirin û derzîlêdanê were derxistin û piştra fetrûmekirin têde were nivîsandin.
2. Belgeya piştrastkirina bijîşkî dikare vê yekê piştrast bike ku parêzbendiya li hemberî Nexweşiya Sorikê (têderxistî û teşxîsdayî bi riya ceribandîna xwînê) heye an fetrûmekirinê pêkanîna parêzbendiyê pêk hatine.
3. Heke rewşa fetrûmekirin û derzîlêdanê nediyar be, Komîsiyona Hertimî ya Fetrûmekirinê (STIKO) şîretê dike ku fetrûmekirinê din pêk bîn. Ceribandîna xwînê nayê tewsiyekirin.

6. Zarokê min pêştir tûşî Nexweşiya Sorikê bûye. Gelo di vê rewşê da fetrûmekirin dîsa jî pêwîst dike?

Her kesek divê tenê carekê tûşî Sorikê bibe. Kesê ku pêştir tûşî vê nexweşiyê bûbe, li hemberî wê hatiye parêzbendîkirin û êdî ti hewcetiyeke bi derzîlêdanê tune. Eva ku kesek pêştir tûşî vê nexweşiyê bûye û ew derbas kiriye an na, bi ceribandîna xwînê dikare were selimandin.

7. Kijan derziyên Sorikê li ber dest in?

Jibo derzîlêdana li hemberî Sorikê li Almaniyê di dema niha da tenê dermanên pêkhatî yên (Bineguh (Mumps)-Sorik-Röteln (MMR)) anjî (Bineguh (Mumps)-Sorik- Röteln-Kuxikreşê

(Varizellen) (MMRV)) li ber dest in. Beşa Sorikê ya van dermanan pêkhatî ji vîrûsa zindî ye ku ji vîrûsên lawazbûyî yên Sorikê hatiye berhamhatin. Antîjenên (Antigen) nexweşiyên 'Röteln', Mumps û Kuxikreşê (Varizellen) jî hevriyên vîrûsa lawazbûyî yên pêkênerê (hokara) nexweşiyê ne.

Bi mebesta gihandina derzîlêdanê bo asta herîkêm li zarokan, bikaranîna fetrûmên pêkhatî yên bi riya STIKO'yê bi giştî tê pêşniyarkirin. Pergala berevaniyê ya zarokê saxlem dikare gellek baş li hemberî vê fetrûmê bertekê nişan bide. Fetrûma pêkhatî bi giştî gellek zêde ji fetrûma tekane xedar û dijwar nîne.

8. Heke jibo zarokê mezintir ji yeksalî belgeyek neyê raberkirin, dê çi biqewime?

Zarokên ku jibo wan belgeyên pêwîst derbarê parêzbendiya li hemberî Sorikê tunebin, nikarin li navendên têkildar bikevin bin baldariyê. Helbet ev yek derbarê zarokên ku pêwîstiya qanûnî ya ders-xwendin û perwerdehiyê li ser wan heye, rast nîne.

Heke enistîtûya Paul-Ehrlich li ser malpera xwe jibo hemî fetrûmên pêkhatî ji pêkhatî Soirkê (ku jibo raberkirina li Almaniyê rêpêdayî an bi-destûr in) sînordariya raberkirinê ragihandibe, vawêrtina (îstîsna) giştî ji qedexetiya pejirandîna qabnûnî tê qebûlîkirin.

Jibo zarokên ku di dema cihanîna qanûnê di roja 1ê Adara 2020'î da li navendên têkildar di bin baldariyê da bûne, rêzikên taybet tîn sepandin. Derbarê van zarokan, Rêveberiya Tendurustiyê (piştî bidawîhatina Heyama Derbasbûnê heta roja 31ê Hezîrana 2021ê) bi awayê babetê dê biryarê bide ku gelo qedexetiya pejirandinê were ragihandin an na (Ji billî zarokên ku gihiştine temenê dibistanê).

9. Dema ku Rêveberiya Tendurustiyê pê hesiya, dewama pêvajoyê dê bi çi awayî be?

Heke belgeyên pêwîst di heyama moleta diyarkirî da (herîkêm deh rojan û derdora herîpîr sê mehan dem jibo dabînkirina îmkana dubarekirina fetrûmekirina du-qonaxî jibo parêzbendiya li hemberî Sorikê) bo Rêveberiya Tendurustiyê nehatibin raberkirin an ji belgeyan wisa were famkirin ku parêzbendî bi riya derzîlêdan û fetrûmekirinê di demeka derengtir da pêkan e, Rêveberiya Tendurustiyê dikare dêbavên zarok jibo şewirîna bang bike û daxwaza kemilandîna parêzbendiyê bi riya fetrûmekirina li hemberî Nexweşiya Sorikê bike.

Bêyî berçavgirtina vê mijarê, Rêveberiya Tendurustiyê dikare ku biryarê bide ka gelo piştî jidestçûna moleta pêwîst, qedexetiya pejirandin û wergirtinê were ragihandin an di berdêla wê da sizaya pere û dayîna pereyê neçarî were sepandin.

10. Gelo pêwîstiya bi fetrûmekirin û derzîlêdana zarok li hemberî Nexweşiya Sorikê li dijî mafê qanûnî yê wergirtin û resepsiyona li Navenda Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan nîne?

Na. Heke berpîrsê Alîkariya giştî bo Xortan, belgeyên derfeta lêmiqatebûnê ya hevseng li gorî hewcetiye raber bike, mafê piştgiriye li Navenda Rojane û li Navenda Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan bi riya vê belgeyê dê serê xwe digire. Ev yek heta di rewşa ku zarok ji ber nebûna belgeyê derbarê fetrûmekirina pêkanîna parêzbendiyê li hemberî Nexweşiya Sorikê nekare were baldarîkirin, rast e.

11. Gelo sizayên pere tîn sepandin?

Jibo rêveberiyên têkildar hîç pêwîstiyek jibo sepandina Sizaya Pere tune. Ev yek girêdayî bi nirxandinê li gorî erkên wan e. Li gorî Qanûna Parastina li hemberî Nexweşiyên Vegir û Bi-kêmgirtin, bi aşkiratî mijara „Rêzikên Dilxwazî“ tê hilêxistin. Rêveberiya navendekê, ku berovajîya qedexetiyên qanûnî ji kesekî baldariyê bike, an li gorî pêwîstiya ragihandinê, Rêveberiya Tendurustiyê haydar neke, her wiha kesên ku tevî hebûna pêwîstiya raberkirina belgeyê û daxwaza Rêveberiya Tendurustiyê, di moleta diyarkirî da hîç belgeyekê raber nekin, divê sizaya pere heta herî pirr 2500 Euro gengaz bizanin. Heke pêwîstiya raberkirina belgeyê neyê berçavgirtin, ji billî Sizaya Pere an di berdêla wê da renga dayîna pereyê neçarî jî were berçavgirtin.

12. Gelo gengaz e ku pêwîstiya fetrûmekirin û derzîlêdanê bi zorê were cihanîn?

Fetrûmekirina bi zorê bi ti awayî di rojevê da nîne.

Weşan:

Bundeszentrale für gesundheitliche Aufklärung, Köln.
Hemî maf parastî ne.

Amadekirî bi hevahengiya digel Bundesministerium für Gesundheit,
û Robert Koch-Institut her wiha Paul-Ehrlich-Institut.

Ev danezana bo welatiyan li ser rûpela sereke ya malpera
www.masernschutz.de (german) bi awayê belaş û bêpere jibo
daxistinê tê raberkirin.